

SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com

Hejmar: 15

Dîrok: Çile 2025

Biha: 1000

DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ



Em ê li ber xwe bidin, em ê şer bikin, em ê bi ser bikevin

BERXWEDAN JÎYAN Û

2 NERÎN:

Gelekî Çekdarkirî û Xwedî Artêş Têk Naçe!

3 JIN:

Li Dijî Çeteyê Cîhatker ên Dijminê Jin; Biji Têkoşîna Yekbûyî ya Jinan

4 ROJEV:

Yekîtiya Neteweyî û Helwesta Komünîstên Rojavayî

6 CIWAN:

Bi rihê seferberiyê qeyd û bendant bişkînin

Gelekî Çekdarkirî û Xwedî Artêş Têk Naçê!

Li Dîrokê Nihêrîneka Kin:

Hafiz Esadê ku di salên 1970an da bi derbeyeka leşgerî bû desthiladar hemû bendên aborîyê di destê dewletê da kom kir. Büyüna endamê BAASî ji bo xwe gihandina çavkanîyên aborîyê imtiyazek bû. Di alîyekî da xisleta netewparêzîya Ereb a dewletê dihat parastin, lê di alîyê din da jî bi rîya partîyê BAAS civak bi imtiyazên aborî bi rejîmê ra dihat girêdan. Bi vî awayî netew û olên cuda di heyameka dîyar da hat xistin bin denetimê. Encax, qeyrana pergala aborî ya neolîberal a ku di sala 80an da dest pê kirîye û di sala 90an da kûr bûye di heman demê da nakokîya di navbera gel û dewletê da zivirand pevcûnê. Pergala înakar û dagirkerîya ku bi rîbazeka "herm" pêş ve diçû ket qeyranê. Bi taybetî li Bakur bilîndbûna têkoşîna azadîya neteweyî hişt ku di nav kurdên Rojava da jî hisyâriyek çêbibe. Ciwanê Kurt ên ku li Bakur, Rojhilat, Başûr û Rojava di nav têkoşîna çekdarî da cih girtin tecrûbeyeka mezin bi dest xistin. Dê êdî netewparêzîya Ereb, dewleta ku spartîye yek netew bibana mijara rexneya çekdar.

Di Belgenameya Bername û Stratejiya TKŞê da komünîst mijarê weke "di hedefa stratejik a tevgera komünîst da demokratikkirina Sûriye disekine. Ji xwe ra dike armanc ku pergala gelparêz demokratik û şoreşger a Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûri belavî tevahî Sûriye bike. Di bin şertên bendewarî û hevkariya emperyalîyetê da, di bin şertên hebûna mudaxelekar a hêzên mêtîngehkar ên herêmê da hedefa demokratikkirina Sûriye weke pirsgêrêka şoreşê dixe holê." digirin dest.

Soreşa Rojava, Rêveberîya Xweser a Demokratik a Bakur û Rojhilatê Sûri

Şoreşa ku di sala 2011an da dest pê kir, bi xeta xwe ya demokratik û azadîxweziya jin mekanîzmaya rîveberîya ku spartîye meclîs û komînan ava kir. Gengazîya pergaleka ku spartîye serdestîya gelên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Tirkmen HWD. û gengazîya yekîtî û wekhevîya gelan nîşan da. Pişî şerê parvekirinê yê emperyalîst ê 1emîn, li Rojhilata Navîn pêvajoya mêtîngeha kapîtalîst û nîv mêtîngehkarin lez bi dest xist. Li dijî serdestîya "yek ol, yek dewlet, yek ziman" ku girêdayî stratejiya parce bike û bi rî ve bibe pergala ku

li Rojava hatîye avakirin bû gefeka mezin. Rastîya ku li vir tê hemberê hev pergala şoreşger demokratik a gelparêz û mêtîngehkarîya emperyalîst e. Îro gotina "bila mafêن kurdan bêน naskirin" a dewletê Emerîka, Fransa, Elmanya û Îsraîl ne ji ber dostanîya kurdan e, ji ber berjewendîyên xwe vê tînin ser ziman. Di kîlîya ku ev ne li gorî berjewendîyên wan be, ji bo tunekirina kurdan û Rêveberîya Xweser a Demokratik dê her cure êrîşan pêk bînîn. Ên ku duh DAIŞ perwerdekirin û çekdarkirin ev bûn. Îro bombevêkî ku dewleta Tirk a mêtîngehkar li Qadêن Parastina Medyayê dibarîne sîleh û tesîsatên ku NATOyê ne.

Bêguman têkoşîna şoreşger, strateji û taktîk, yedekîn yekser û neyekser dihesîbîne. Pevcûn û nakokîyên di navbera hêzên li dijî şoreşê di lehê têkoşîna şoreşger da dinirxîne, ji van sûd digire. Di vê berfirehîyê da dikare hevkariyên taktîkî pêş bixe. Lê divê tu carî neyê jibîkîn ku yekane hedefa bîrdozî û pergala kapîtalîst, emperyalîst hîna zêdetir kedxwarî ye. Îsraîl di alîyekî da dibêje em zilma li ser kurdan rexne dikin, lê di alîyê din da li dijî gelê Filistînê komkujiyên xwe, bombebarana li ser Xezayê berdewam dike. Heman sûcûn ku dewleta Tirk a mêtîngehkar li ser axêne me pêk tîne Îsraîl jî li Filistînê van sûçan pêk tîne. Stratejiya leşgerî ya Îsraîlê girêdayî paradigmeya "serdestîya wesfi ya stratejîk" e. Û niha jî girêdayî vê armanca xwe dixwaze kurdan bike amûr. Dostêr rast ên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûri gelên bindest ên herêmê û cîhanê ne. Biryardarî û îsrara di xeta hevgirtî ya li dijî pergala baviksalar, mêtîngehkarî û emperyalîzmê dê teqezi bi ser bikeve.

Pêşeroja Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûri, Rojava

Ê ku bîryara vê bide sekna bîryardarî ya gelê me yê bi rûmet û sekna pêşengêne wan ên welatparêz, şoreşger û pêşengê komünîst e.

Ger ku gel bibîryar û yekbûyî be, xwedî xeteka şoreşger a rast be, pêşengê şoreşger bi awayekî afirîner şerê gel rîexistin bike dikare hêzeka ji xwe hîna xurtir têk bibe. Hedefa têkoşîna şoreşger yekkirina hêzên sîyasî bi hêzên çekdar ra, yekkirina serhildanê bi şerê şoreşger ra ye.

Ji bo ku karîbin erkêن şoreş bide pêşîya wan bi cih bînîn, divê gelê me di çekdarbûn û artêşbûnê da îsrar bikin. Ger ku gelê me, xwe, axa xwe, pergala xwe ya şoreşger, demokratik û azadîxweziya jin bi sîlehêن xwe, hêza xwe ya parastinê berdewam bike dê têk neçe. Di her bajarî da, di her taxê da avabûna taburêن gel gelekî girîng e. Taburêن şehîd Mefîn, şehîd Avaşîn Têkoşîn Gûneş, Şehîd Zîlan û şehîd Yilmaz ku komünîstan li Qamişlo, Kobanê û Hesekê avakirin wekî ku bawerî da gel, ji dijmin ra jî bû bersiveka zelal. Esasa berxwedana Tişrînê ew e ku tevahî qadêن Rêveberîya Xweser bûn parçeyek ji berxwedana Tişrînê. Esasa vê berxwedanê ew ku gelê me yê ku niha di bin bombeyan da ber bi Tişrînê ve dimeşe, divê gelên me di bin êrîşen SîHAYan da li kolana xwe, li bajarê xwe xwedî cesareta ku hêza berxwedana Tişrînê di hundirê xwe da biafirînin. Ev berxwedana ku yek du sê hîna zêdetir Kobanê afirandî ye.

Dewleta Tirk a faşîst, mêtîngehkar bi îsrar dixwaze HSDê sîleh berde. Ji ber ku gelekî ku di destê wê da sîleh nîn be bêparastin e. Û êrîş û xweferzkirinê mêtîngehkar, emperyalîstan û paşverûyan aşkere ye. Sedema mezin windakirina kurdan a di şerê cîhanê yê emperyalîst ê 1emîn da parçebûna weke herêmî, eşîrtî, feodal û neifirandina wan a rîexistbûnaka û arteşbûna gel a yekbûyî ye.

Îrorastîyakuli Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûri bi kurdan û gelên Kurdistanê daye qezençkirin jî berxwedan, rîexistinbûn, pergala demokratik a yekbûyî û teva vê avakirina rastîya gelê çekdarkirî ye. Ger her bajar, her gund bê kirin keleheka berxwedanê, her karker û gundîyek bibe şervan ne dewleta Tirk a mêtîngehkar faşîst, ne jî çeteyên cîhadîst ên faşîst dikarin encam bigirin. Kîjan tanq, top, fuze û balafirêن şer dikare gelekî ku bi hemû mîjî û dilê xwe, bi sonda tolhildanê difikire û jî bo derblêdana dijmin li benda derfetê ye têk bibe? Nikare têk bibe! Gelekî şervan û rîexistinkirî têk naçê.

Nîşejîr:

**Di 1830an da dema ku Fransayê Cezayîr dagir kir, di pêşengtîya Şêx Abdülqadir da gel dest bi berxwedanê kir. Ligel ku di sala 1947an da Şêx Abdülqadir hat girtin berxwedanê wekî "dewleta biner 40 sal berdewam kir.

**Têkoşîna Rizgarîya Neteweyî ji bo ku hêza gel çekdarbûyî nîşan bide tecrûbeyeka girîng e.



Li Dijî Çeteyên Cîhatker ên Dijminê Jin; Bijî Têkoşîna Yekbûyî ya Jinan

Pergala kapîtalîst a ku qeyrana aborî dijî di heman demê da din nav qeyrana hebûnî da ye û tengezarîyeka civakî û bîrdozîyî dijî. Li dijî tevahî bindestan, jinê bindest politikayê tundî û zextê pêş dixe. Faşizm, netewparêzî, nîjadparêzî, zayendparêzî li her derê bilind dibe. Ji Emerîkayê heta Ewropayê, ji Rojhilata Navîn heta Asya û Asyaya Rojhilata dûr faşizm pêş tê pêş xistin. Lî di heman demê da, di vê pêvajoyê da pêşîya DAIŞ û HTŞê ya ku dijiminê mirovahîyê ye, lê herî zêde jî dijiminê jinan e tê vekirin.

Weke berdewamîya şoreşa herêmî ya ku di 2011an da li Tunusê dest pê kir, gelên Sûrî jî bi daxwazên azadî û demokrasiyêderketin kolanan. Dewletên emperyalîst û dewletên paşverû yê herêmî yên ku dixwastin li Rojhilata Navîn qadêن xwe yên hegemonî-serdestiyê berfireh bikin mudaxeleyî şoreşa Sûrî kîrin. Di alîyekî da Dewletên Yekbûyî yên Emerîka (DYE) û dewletên Ewropayê piştgirî dan çeteyên cîhadker, di alîyê din da Tirkîye li dijî şoreşa me bi navê Artêşa Azad a Sûrî komên çete yên talanker ava kir. Li alîyê din jî Rûsyâ û İranê jî bo berjewendîyên xwe piştgirî dan Esadê dîkdator û emrê wî dirêjkirin.

Rûsyâ jî ber sedema şerê ku li Ükraynayê li dijî dewletên NATOyê dide meşandin mecbûr ma ku leşgerên xwe ji Sûrî vekişîne. İranê jî ji ber êrîşen Îsrailê hêzeka girîng winda kir. Di artêşa Sûrî da jî vîn û hêza şerkirinê nemabû. DYE, emperyalîstên Ewropayê û dewletên paşverû

yê herêmî, weke parçeyekî pîlanêن xwe yên guhertina nexseya Rojhilata Navîn, radestî spartin Esad. Esadê ku tu vîna şerkirin û berxwedanê nîşan neda Sûrî teslîmî HTŞê kir.

Di heman demê da çeteyên dewleta Tirk Til Rifat, Şehba û Minbic dagir kir. Dewleta Tirk pêşdatir gefan li Kobanê û tevahî Bakur û Rojhilatê Sûrî dixwe û ji bo êrîşê li benda derfetê ye.

HTŞê, di demeka kin da helwesta xwe dîyar kir ku bikeve xizmeta dewletên emperyalîst ên DYE û Ewropa, Îsraîl a sîyonîst, dewleta Tirk û dewletên paşverû yê herêmî. Ew jî dixwazin stubend (qerwêt) û bedil li Colanîyê cîhadker bikin û imajêkî nû biafirînin. Dixwazin ji HTŞê ya faşîst, islamker a politîk hêviya avakirina Sûrîyeka demokratîk çêbikin.

Di esasê da derdekî wiha yê hêzên ku mudaxeleyî Sûrîye dikin jî tune ye. Hemû derdê wan ew e ku gelo petrol, dewlemendîyên binerd û sererd ên Rojhilata Navîn dê kî kontrol bike ye. Vê yekê di heman demê da bi rîya dewletên hevkar pêk tînin. Tiştê ku di ev dema kin da derkefiya holê ew e ku dê HTŞê bibe havkarekî baş. Ew ên ku li dijî êrîşen li ser şoreşa me ya demokratîk, gelparêz û azadîxweziya jin bêdeng man, ên ku li dijî dagirkerîyê bêdeng man niha çîrokên ku dê Colanîyê cîhadker azadî û demokrasî jî jin û gelan ra bîne dixwînin.

Di pratîkên wan ên dawî da xuya dike ku dê ew ê pêşdatir gelê me yê Elewîyên Ereb û gelên kuneislamkerên politîk in

di komkujiyan ra derbas bikin. Lî jin bi êrîşeka hîna mezintir ve rû bi rû ne. Di nav HTŞê da rîexistin û şexsên wekî DAIŞ û El Qeydê yên cîhadker hene. Em van hem ji ew kiryarênu ku HTŞê li Îdlîbê li ser jinan pêk anîne, hem ji kiryarênu hov ên ku DAIŞê pêşdatir li ser jinê Ézidî û jinê herêmî pêk anîne dizanin. DAIŞê li Şengalê bi hezaran jin û zarok revandin, bazarênu koleyan ava kir û ew mehkûmî jîyaneka dermirovî kîrin.

Di heman demê da DYE bi gotinêñ derew ên wekî "em ê ji terora islamker paqîj bikin, em ê demokrasî û ji jinan ra azadî bînîn" bi salan Efxanîstan di bin serdestîya xwe da girt û piştre ji wir vekişîya û wir radestî Talîban kir. Rastîya Talîban a kiryarênu li ser jinê jî li holê ne.

Talîban tevahî mafênu jinê jî holê rakir. Jin kîrin koleyên mîran. Mafa jinê ya çûnehatinê, mafa derketina wê ya bi tenê, pişti sefa pênc xwendina zarokên keçîn hat qedexekirin. Talîban jinan hepsî naybera çar dîwaran dike û bi vî awayî koletîya hundîrê malê kûrtir dike.

HTŞê hîna berî ku hikûmetê ava bike kirýara xwe ya yekemîn êrîşa li ser jinan bû. li Humusê jina dadwer jî erkê hat kişandin. Jin mecbûrî danîna hîcabê tênu kîrin. Di hikûmetê nû yê ku bê avakirin da jin cih nagirin. Ofisa jinê hat avakirin û jina ku di wê ofîse da hatîye erkdarkirin nîşan dide ku dê ew ê bibe hîmê binhegin ê êrîşen li dijî jinan bibe. Eyşe El Dibs a ku 10 salan li Tirkîye maye bixwe dibêje ku dê ew ê li Sûrîye bibe şopdara siyaseta AKPê ya dijminatiya

jin. Hîna di daxuyanîyê xwe yên yekemîn da anî ser ziman ku dê bendên şerîtê bîn sepandin û erka jinê mal û xwedîkirina zarakan e.

Hema li kîleka Sûrî, li Bakur û Rojhilatê Sûrî jî rastîyeka cuda heye. Şoreşike jin ku bi têkoşîna jinan a bi dehan salan hatîye hûnandin tê jîyîn. Jin bi rîya YPJê, Asayîşa Jin, Hêzên Xweparastina Cewherî ya HPC-Jin şoreşa xwe diparêzin. Li tevahî saziyan nûnerfiya hevbeş û hevserokatî, rîveberîyê jin û meclîsîn wê şirîkê şoresê, hêza rîber û pêşeng e. Di heman demê da zagonênu jin hatine derxistin, di sûcênu li dijî jinê ceza hatine girankirin, zewacênu di temenê biçuk da û zewaca zêde hatîye qedexekirin.

Bûyerên ku li Sûrî têj jîyîn şoreşike rikeber (dijber) Li Sûrîye serdestîya mîr ya ku bi qeydîn şerîtê ve bûye yek bi awayê herî hov bê sepandin û di pêvajoyê pêş da HTŞê her ku serdestîya xwe xurt bike wê ev hîna zêdetir bê sepandin. Jinê Misliman jî di nav da jinê Durzî, Ézidî, Xirîstîyan û jinê jî bawerîyê din bi xetereyeke mezin ve rû bi rû ne. Berî her tiştî divê em li dijî ev xetere û hovîftîyê têbikoşin. Ev berpirsiyartî di serî da li ser milê me jinê sosyalîst û komunîst e. Em van êrîşan encax bi têkoşîna yekbûyî ya tevahî jinê Sûrî dikarin bidin sekinandin.

Divê di navenda xebatê me yên 8ê Adara vê salê da parastina şoreşa me ya jin û bi tevahî jinê Sûrî ra rîexistinkirina têkoşîna yekbûyî hebe. Divê em di alîyekî da ji bo avakirina bingeha têkoşîna hevbeş a jinê Sûrî hewl bidin, di alîyê din da em jinan rîexistin bikin da ku di rîexistinê me yên parastina cewherî da cih bigirin, li taxan komên parastina cewherî ava bikin û perwerdeyêne silêhan berdewam bikin. Em weke jinê JKŞyî jî jinan ra bangewaziya me "ji bo jîyaneka azad û wekhev em hîna zêdetir li qadan bin, em hîna zêdetir têbikoşin." Em encax bi berxwedan û şerkirinê dikarin serkeftinê bi dest bixin. Di 8ê Adarê da ji bo ku em xwedî li vîn, pêşeroj, azadî û mafênu xwe derkevin, ji bo parastina destkeftinê xwe em derkevin qadan.



Yekîtiya Neteweyî û Helwesta Komunîstên Rojavayî

Di asta ku têkoşîna me ya neteweyî gihaştiyê da, nîqaşen yekîtiyê bûye rojeveka girîng. Büyerên ku di dawîya ribek salê da hatin jîyin û zehmetîyên ku şoreşa Rojava dijî, nîşan dide ku yekîti ew qas bi hêsanî nayê avakirin. Lî em dixwazin xweşbînîya xwe ya di vê mijarê da biparêzin.

Di dîroka Kurdistanê da, her tim sedemên cuda hatin derxistin pêş yekîtiya neteweyî. Di dîroka derbasbûyî da, berjewendîyên eşîrtî yên feodal li pêşîya pêşketina zanebûna neteweyî û yekîtiyê astengî derdixistin. Piştî wê, bi çar parçekirina Kurdistanê û avakirina sînoran, ne netê teva partîyan sîyasî, lê gelê me jî dûrxistina ji hev hat hedefkirin.

Îro, cihêrengbûna çînayetî ya ku di civaka Kurdistanê da pêş ketîye û cudatîyên bîrdozî yên di navbera partîyan da, dihêle ku di nava hêzên neteweyî refbûnek çêdibe. Di aliye kî da dema ku cudatîyên nêrînên bernameyî, derbasî pêşîya hevkariya sîyasî dibe, di heman demê da hin hêzên Kurd berê dan dewletên ku Kurdistanê di bin nîra mêtîngerîyê da digirin.

Em refbûna di navbera hêzên Kurd da di milê pêwîstîyên îro da dikarin wiha şirove bikin. A yekemîn, hêzên ku dixwazin xwedî li têkoşîna azadîya Kurd û destkeftinêneteweyî derkevin û wê pêş bixin. A duyemîn hêzên ku dixwazin parçebûna Kurdistanê bidin domandin û bi mêtîngehkaran ra hevkari dikin û berjewendîyên xwe ji destkeftinêneteweyî girîngtir dibînin.

Gelê me, di sedsala dawî da ji parçebûna neteweyî razî nebû û serê xwe netewand. Lî jî bo ku serhildanênu hatin destpêkirin jî di bingeha yekîtiya neteweyî da pêş neketin mecbûr man ku paşve vekişin. Helwesta ïxanetkar a ku di bingeha hevkariya bi mêtîngehkaran ra pêş ket, her tim li pêşîya destkeftinêneteweyî bû asteng. Hêzên têkoşîna neteweyî yên Kurd, di mijara afirandina rîberîyekî yekbûyî bi ser neketin.

Di merhaleya ku em gihaştinê da, em dibînin ku sedema dûrketa ñî hev a hêzên Kurd ne cudafîyên têkoşîna rizgarîya neteweyî ye. Gelo hêzên Kurd, li dewsa mezinkirina têkoşîna neteweyî çîma li dijî hev ketin nav itifaqan? Bersiva ku ji vê pirsê ra bê dayin; rasterast girêdayî cihêrengbûna çînayetî ya ku di civaka Kurdistanê da pêş dikeve ye.

Li Başûrê Kurdistanê, pêşkeşnekirina helwesteka yekbûyî ya du partîyan, bû sedem ku ev parçeyê Kurdistanê rasteqîn bibe 2 parce. Em di pêvajoyeka ku pevçûnêni di navbera hêzên Kurd da êdî weke "Birakuji" nayê binavkirin da dijîn. Ger ku partîyekî Kurd, di dirêjahîya 15 salan da bersiveka erêni nede bangewazîyên yekîtiyê, divê em karibin bêjin, ev partî ne ji yekîtiya Kurdan, ji parçebûna Kurdan hêvî dike.

Em naxwazin li ser mijara gelo yekîtiya neteweyî Kurdan çawa nayê dabînkirin, baxivin. Lî em rastîya xwe baş bizanibin û em dixwazin li ser bingehîn saxlem



gavêne xwe ber bi pêşerojeka ku gelê me karibe azad bijî ve bavêjin.

Êdî, şoreşa ku li parçeyê Rojavayê Kurdistanê, li ser têkoşîna li parçeyê din jî bandoreka mezin afirand. Kes ne li bendê bû ku li Rojava şoreşek pêk were. Şoreşa gelparêz, demokratik û azadîxweziya jîn, hemû partîyen Kurd nekiribe yek jî, dilê gelê me yê Kurd ê li 4 parçeyê Kurdistanê kir yek.

Di merhaleya ku em gihaştinê da yekîtiya hêzên demokratik ên neteweyî girîngtirin e. Û pêwîst e ku ev yekîti dema herî kin de pêk were. Em hîmîn ku ev yekîti li ser pêk were wiha digirin dest:

* Dê yekîtiya neteweyî, moral bide têkoşîna neteweya Kurd, dê ev yekîti zanebûna neteweyî û hêvîya Kurdistanâzad mezin bike. Divê ev gotina Cegerxwînê ku nîrxa me ya neteweyî ye ji me ra bibe rîber û rînîşander: "Kurdno bibin yek, ger em nebin yek, em ê herin yek bi yek"

* Divê yekîtiya neteweyî, Kurdistanâzad û serbixwe ji xwe ra bike hedef. Divê destkeftinê li her parçeyî, weke destkeftina hemû neteweyê bihesibîne û xwedî lê derkeve.

* Nûnertîya demokratik girîng e, divê di yekîtiyê da nûnertîya tevahî komên ku tevîlî têkoşîna demokratik a neteweyî ya Kurd dibin bê dabînkirin.

* Parçebûn û reqabetê hişt ku em bi dehan salan winda bikin. Divê reqabeta serdestîyê, li pêşîya berjewendîyên neteweyî nebe asteng. Divê berjewendîyên partîyan li alîyekî bê hiştin û weke stratejîk bê fikirîn.

* Di pêkhatina zanebûna neteweyî ya demokratik da rola jînên Kurd dîyarker e. Divê teqez mafa nûnertîya hevbes li ber çavan bê girtin. Divê rîgeza-prensîpa hevserokatî û nûnertîya hevbes di tevahî mekanîzmayêne yekîtiyê da bê misogerkirin.

* Kurdistan, ji alîyê emperyalîstan ve hat 4 parçekirin. Lî jî bo me Kurdistan yek e. Divê tu kesên Kurdistanî, sazî an jî dezgeh li tu parçeyên Kurdistanê weke "biyanî" neyê dîtin.

* Dema ku mijara pêşeroja şoreşa Rojava bibe mijara gotinê, tu partîyekî Kurd nikare hebûna partîye din bixe

nîqaşê û nikare bêje "bila ew derkeve" Dîrok, mafaka gotinê ya wiha nade hêzên Kurd.

* Divê li Rojavayê Kurdistanê, ji bo partîyên Kurd hedefa tekane, bibe kombûna li derdora pergala Rêveberîya Xweser a ekolojîk, azadîxweziya jîn, gelparêz, demokratik û parastina wê.

* Ji bo pêşketina yekîtiyê, li dijî êrîşenjenosîda mêtîngehkar ku tesfiyekirina Rêveberîya Xweser dike hedef divê yekîtiya têkoşîna leşgerî û sîyasî bibe pîvana bingehîn.

* Destpêkê wekî Efrîn, Serê Kanîyê, Girê Spî hin bajarê Rojavayê Kurdistanê di bin dagirkerîye da ne. Ji axên me derketina dagirkeran û dabînkirina vegera gelê me ya malên xwe divê bibe mijara têkoşîna hevbes a hêzên li Rojava.

* Gelê me, ne mehkûmî garantoriya destpêkê dewletên wekî DYE, Îsraîl, Rûsyâ an jî dewletên din ku Rojhilata Navîn dizivîrinin gola xwînîye. Garantorê herî mezin, hêza rîexistinkirî ya gelê me ye.

* Li herêmên Rêveberîya Xweser hêza leşgerî tekane ye. Hêzên Sûrî yên Demokratik (HSD-QSD) û Yekîneya Parastina Jin (YPJ) ku şoreşa me diparêze rûmeta me ye.

* Kurdistan tenê ne welatê Kurdan e, di heman demê da welatê tevahî gelên ku li Kurdistanê dijîn e. Divê mafên wekhevîya tevahî bawerî, komên neteweyî û neteweyan bêni misogerkirin. Tevahî gelên ku li ser axên Bakur û Rojhilatê Sûrî dijîn di nav yekîtiyekî dildar, azad û wekhev da dijîn. Divê pergala demokratik a ku wekhevîya gelan esas digire bê xurtkirin.

* Têkoşîna Azadîya Kurdistanê, ji bo tevahî gelên Rojhilatê Navîn mînak e. Divê têkoşîna hevbes a bi tevahî gelên bindest ên Rojhilatê Navîn, komên bawerîyan ra bê armancirkirin.

* Divê her cure pevçûnêni di navbera hêzên demokratik ên neteweyî da teqez bêni qedexekirin. Divê ji bo çaresarıya pirsgîrêkîn navbera partî û koman dîwanekî edaletê bê hilbijartîn.

* Divê yekîtiya neteweyî, êrîşeka li ser pêkhatayekî besdar weke êrîşa li ser hemû pêkhatayen bihesibîne û li gorî vê rîgezê helwesta xwe nîşan bide.

Piştî serhildana gelê Ereb li Rojhilata Navîn bi taybetî li Iraq û Sûriyeyê rê li ber çeteyên selefi-cîhadîst vebû. DYE ya emperyalîst a ku dixwest Rojhilata Navîn ji nû ve biguherîne, ji bo armancê xwe yên sîyasî piştgirî da van çeteyan.

DYE ya ku li Efxanîstanê li dijî Yekîtiya Sovyetê piştgirî da tevgerên İslâmî yên sîyasî yên weke El Qayde û Talîbanê, li Rojhilata Navîn ji heman politika meşand. Di lawazkirina tevgerên gelêr yên şoreşgerî yên li Rojhilata Navîn da rol lîst. Li welatênu ku rejîmên Şîî û BAAS hebûn, politikaya destpêkirina şerê navxweyî ji alîyê çeteyan ve dihat meşandin.

Projeya 'Welatênu İslâmî yên nerm' ku ji alîyê DYE yê ve ji bo xurtkirina têkîlîyên bi hikûmetên Sunî ra hat afirandin, bi rîbazên nû berdewam kir. Dem bi dem rol hat dayin dewleta Îsrail a sîyonîst.

Piştî sala 2011an çeteyên faşîst ên İslama sîyasî demekê li Iraq û Sûriye hin herêm dagir kirin. Piştî dagirkirina Mûsilê DAIŞ û xîlafet hatin îlankirin. Yek ji hedefîn destpêkê yên êrîşê Şengal bû. Di vê heyamê da Cephet El Nûsra herêmên Dêrazor û Reqa ji hêzên rejîmê standin. Çeteyên DAIŞê vê carê axa Rojavayê Kurdistanê kirin hedef. Ji alîyekî ve li Sûriye belavî qadeka berfireh bû. Hêzên emperyalîst û dewletênu herêmê yên paşverû bi eşkereyi piştgirî nedan êrîşen DAIŞê. Lî belê çekêngiran û alavêne leşkerî dane DAIŞê. Û gelek xizmet hat pêşkêşî wan kirin. DAIŞê û dewleta Tirk bi hevra hewl dan ku axa şoreşa Rojava dagir bikin. Çeteyên DAIŞê ji bo têkbirina sistema Rêveberîya Xweser a ku wekhevî û azadî di navbera gelan da pêk anî, êrîş kirin.

DAIŞ çûbe ku derê komkujiyên hovane pêk anî. Komkujiya mezin a 3ê Tebaxâ 2014an li Şengalê dest pê kir, wê tu carî neyê jibîrkirin. Piştire ji çeteyên DAIŞê bi hevkâriya dewleta Tirk êrîşî Kobanê pêk anîn. Jin li herêmên ku feraseta DAIŞê serdest bû di malên xwe da hatin hepskirin. Jinê ku ji herêmên dagirkirî hatin girtin li bazaran hatin firotin. DAIŞ bûye dijminê herî mezin ê azadîya jinê.

Netew û bawerîyên cuda li Sûriye bûn hedefa komkujiyên hovane yên DAIŞê. Ezidî, Durzî, Elewî û Xiristîyan hatin qetilkirin.

Dijminê Gel

DAIŞê li hemberî artêşa şoreşger nikarî li ber xwe bide û têk çû. Bermahîyen DAIŞê xwe spartin herêmên ku ji alîyê HTŞê û dewleta Tirk ve hatine dagirkirin. Ew hatin pêşxistin û bûn emîren çeteyan. Serokê DAIŞê El-Bexdadî û gelek çeteyên wî dema ku xwe li herêmên di bin kontrola HTŞê da vedişartin hatin kuştin.

Heyet Tehrîr El-Şam

Şaxa Sûriye a El-Qaydeya Iraqê di bin navê Cepheya

stûyê xwe û besdarî civînên diplomatik dibe, ev yek sûcêne wî û çeteyên wî ji holê ranake.

Bermahîyen DAIŞê

Çeteyên Heyat Tahrîr El-Şam (berê Cephet El Nûsra) ku bi salan Idlib dagir kiribû, bi heman awayî ji alîyê hêzên emperyalîst ve hat piştgirîkirin. Bi DAIŞê ve xwedî heman ferasetê bû. Ji bo afirandina desthiladarıyeka selefi, cîhadîst êrîşî Helebê kir û piştire bajarê din ên Sûriye

zîhnîyeta xwe derxist holê. HTŞê bi taybetî li herêmên Lazqîye û Tertûsê li dijî gelê Elewî komkuji pêk anî.

Bi Projeya Kembera Kesk Hatîn Piştgirîkirin

Tevgerên İslama sîyasî di dema Şerê Sarda diçarçoveya sîyaseta Kembera Kesk a DYEYê da hatin bikaranîn û pêşxistin. Destpêkê emperyalîzma DYEYê û Erebîstana Seûdî û dewletên herêmê yên din mewdûuat kirin. Islamkerên nerm xwestîn di çarçoveya pergala parlementeriya burjuva da



El-Nusra da besdarî şerê navxweyî yên Sûriye bû. Ehmed El-Şara (Ebû Mihemed El-Colanî) bû serokê çeteyan. Çeteyên El Nûsra di sala 2016an da ji DAIŞê veqetîyan. Pêşî navê xwe weke "Cepheya Fetîha Şamî" anîye ziman. Çeteyê El Nûsra yên ku di bin siwana dewleta Tirk a dagirker da li Idlibê bi cih bû, li ser komên cuda yên cîhadîst serwerîya xwe ava kir. Cephet El Nûsra ku êrîşî Serê Kanîyê ji kir, ji ber ku di lîsteya rîexistinê terorê da cih girt, navê xwe guhert û kir "Heyet Tahrîr El-Şam". Wan berê xwe da avakirina xeteka İslâmî ya "maqûl" ku ji alîyê hêzên emperyalîst ên rojavayî ve were qebûlkirin.

Dixwestin li ser xeteke ku dewletênu Ereban netirsîne, imaja ku ji alîyê DAIŞê ve hatîye afirandin ji holê rakin û piştgirîyeka berfirehtir bibînin, bimeşin. İro dema em dinêrin ku ci li ser gelê Sûriye dîkin, em dibînin ku kiryarêne wan qet kêmî kiryarêne DAIŞê namînin. Komkûji, talan, şkence, destavêtin û her cure êrîşan pêk tînin. Ji bo ku Ehmed El Şara stûbend (qerwêt) dixe

dagir kir. Dewletênu burjuva yên paşverû, bi taybetî ji DYE, Ingîlîstan, Erebîstana Siûdî û Tirkîye ve piştgirî da HTŞê.

Di serdema kûrewîbûna emperyalîst da, tevgerên İslâmî yên sîyasî ji bo afirandina pergaleka nû ya cîhanê bûn beşek ji hewildana DYE û hevkârên wî yên emperyalîst. Çeteyên selefi misilmanen ji mezhebîn cuda ji bi awayekî hov qetilkirin. Rojhilata Navîn bi hevkâriya çete û emperyalîstan veguherî gola xwînê.

Niha li Rojhilata Navîn serdemeka nû ku bi politikaya êrîşkarîyê ya bi rola dewletênu dagirker Îsrail û Tirkîye sînor ji nû ve bênen dîyarkirin tê xwestin.

HTŞê ya ku piştî rûxandina rejîma Esad çû Şamî ji besdarî vê planê bû. Pêngava yekem a HTŞê ku daxwaza avakirina hikûmeteke li gorî qanûnên şerîtetê ragîhand, bi emperyalîst û dewletêna paşverû ra têkîlîyên diplomatik danî. HTŞê ya ku dixwaze azadîya jinê ya jixwe sînordar hîn zêdetir destesar bike, bi bernameya xwe ya perwerdehiya paşverû ra ji

û yên tundraw jî xwestin li ser esasê İslâmî dewletan hikûmetan ava bikin. Di dema ku dixwestin muhafezekarîya civakî biafirînin, di astênu cuda da ji bo pêşketina şoreşgerî rola hêza lêxistinê lîstin. Li welatênu wek Iraq, Sûriye, Malî, Somalî, Efxanîstan, Pakîstan û Nijeryayê rol lîstin.

Tevgerên İslâmî yên sîyasî iro ne li dijî kapîtalîzmê ne, ne ji antî emperyalîst in. Ew ên ku dîktatorîya teokratîk diparêzin û pêk tînin, tundî li dijî civakîn olî yên cihêregîn û civakîn ji bo azadîya xwe ya neteweyî li ber xwe didin, rewa dîtin. Wan koletîya jinan dixwest. Li dijî wan kesen ku teslim nebûne qirkirin û hovîti kirin.

Her çiqas tevgerên İslâmî yên sîyasî yên tundraw digotin ku ew li dijî xirabîya emperyalîzmê û hikûmetên burjuva yên nûjen in, lê ji bo avakirina desthilatdarîya İslâmî bi emperyalîstan ra hevkârî kirin. Ji gelên Misilman dikarin piştgirîya girseyî bistînin, lê ji ber hovîtiya ku dîkin û rîgezîn wan ên hîş ên civakî, hêz winda dîkin û wê hêz winda bikin.

Bî rihê seferberîyê qeyd û bendar bişkînin

Di 19ê Tîrmeha 2012an da şoreşa Rojava i Kobanê hat ïlankirin. Ji wê rojê heta niha bi berdêla bi hezaran şehîdan ev şoreş hat mezinkirin û parastin. Şoreşa Rojava bi îtifaqa gelên Ereb, Sûryan, Tirkmen û Ermen a bi gelê Kurd ra bû şoreşa Bakur û Rojhîlatê Sûriye. Ji kîliya ku şoreşa me dest pê kir heta niha, li hemberê hemû êrîşan bi berxwedaneka mezin li ser lingan ma. Li hemberê tarîfîya DAİŞê ya ku hemû cîhan li hember wan ji tırsan dicirifi, hêza me YPG-YPJê serkeftineka dîrokî bi dest xist. Dewletê emperyalîst nedikarîn pêşîya êrîş û komkûjîyên DAİŞê bigirin, lê şoreşa me li hemberê DAİŞ û dewleta Tirk gelê xwe parast.

Serkeftin û hebûna şoreşa Rojava derî li ber ketina Rejîma BAAS a mêtîngehkar jî vekir. Dîktatorîya Beşar Esad heta kîliya dawî jî xwest ku şoreşa me radest bigire lê bi xwe teslîm bû. Di dîrokênu Rejîma BAAS hilwesîya da dewleta Tirk a faşîst bi hemû çeteyên xwe êrîşa li dijî welatê me, da destpêkirin. Li hemberê vê rewşê Rêveberîya Xweser seferberîya giştî ïlan kir. Şoreşa me hem bi pêlên êrîşê yên bejahî-hewayî ra, hem jî bi pêlên koçberîyê ra rû bi rû ma. Bi tevahî gelên Şoreşê di her warê da bi erk û berpirsyartîyên seferberîyê rabûn. Derîyen malên xwe ji koçberan ra vekirin, bi her derfetê alîkarîya wan kirin. Di alîyê din da jî ciwanan berê xwe da cepheyên şer û di nav parastinê da cihê xwe girtin. Şefê faşîst Erdozan, di vê pêvajoyê da xwest ku xeyala xwe ya ‘Kobanê bikeve’ pêk bîne. Lê berxwedana gelên me, berxwedana QSD-YPJê gotinên faşîstan di qirika wan da hişt. Berxwedana li Tişrîn û Qereqozakê serkeftina şoreşê misoger dike û ala rûmetê bilind dike.

Di nav vê pêvajoyê da ciwanan jî bi her awayî cihê xwe girtin û digirin. Bi ïlanbûyîna seferberîyê ra, bi hezaran ciwan û jînên ciwan berê xwe dan nava refîn QSDê û YPJê. Li enîya Minbicê, li Tişrîn û Qereqozakê bi sedan ciwan şehîd ketin. Şervanên Komûnist di bin ala Tabûra Şehîd Serkan da berê xwe dan enîyên şer. Di nav refîn HPCê da û bi

komînên xwe da parastina tax û bajarên xwe kirin. Perwerdeyên çekan hatin lidarxistin. Li kîleka van perwerdeyên rewşa sîyasi û belavkirina belavokan jî hatin kirin.

Lê di vê rewşa seferberîyê ya ku ev rewş ji bo tevahîya gelê Kurd derfeteka dîrokî derdixe holê da, divê em rihê seferberîyê hîn zêdetir bilind bikin û li her derê belav bikin. Rojane li her bajarekî 5 şehîdên me têن spartina axê. Mirovên medenî yên ku di çalakîya mertala zindî da cihê xwe digirin bi balafirîn şer ên dewleta Tirk a faşîst têن bombebarankirin, qetilkirin. Gelê elewî ji alîyê çeteyên HTŞê ve di bin zilm û komkûjîyek mezin ra derbas dibe. Gelê me yê Kurd li Heleb û Şamê wek êsîrên di destê çeteyan da bi her cureya êrîşê ra rû bi rû ne! Şoreşa me ku li ser xwîna bi hezaran şehîdan, xwe ava kirîye şerê hebûn û tunebûnê dide! Ji kîjan netewê be bila be, ciwanan ku li ser axa şoreşê dijîn divê nikaribin di cihê xwe da rûnin, nikaribin bi rihefî razên! Di mirovan da demarek (rih) heye ku jê ra dibêjin demara rûmetê. Lê ev demar di her kesî da tune ye, yê ku xwedîyê vê demarê be; di demek wisa da nikare wek ku tiştek tune bijî. Dema ku bibîne parêzvanan vî welatî dema dikevin destê çeteyan ci bi serê wan tê, an jî ji bo ku nekevin destê wan xwe bixwe şehîd dixin. Wê xwîna wê-wî di vê demarê da hişk bibe. Di wê kîliyê da, dê ji listok, pere, top, maşîne, zewac, mekyaj, motor û hwd... ji her tiştek ku dijmin wê-wî pê mijûl dike sar bibe û berê xwe bide parastina şoreşa xwe.

Rast e, her kes nikare bibe leşker, lê her kes dikare ji bo parastina şoreşa xwe, ji jîyana xwe ya rojane derkeve! Di vir da em wek Ciwanan Komûnist ên Şoreşger, dixwazin tiştekî bînin bîra malbatan jî: ger ku hûn, em, ew, her kes iro dikarin jîyana xwe bi rihefî didomînin; ger ku çeteyên dewleta Tirk, tişte ku tînin serê gelê Elewî nikarin bînin serê me, ev di saya wan şervanan şoreşê da ye. Ew şervanen ku hûn zarokê xwe ji wan dûr dixin, iro rûmeta we diparêzin. Em dizanin ku gelek malbatan me wek ku dişînin dawetê, zarokê xwe dişînin enîyên şer.

Lê yên ku zarokê xwe, malbata xwe, ji bedel dayînê direvînin, ji şoreşê durdixîn, vê bêrûmetîyê ji xwe ra wekê heq dibînin, berê zarokê xwe didin jîyana burjuva û wan dirizînin. Ciwanan ku dixwazin bibin şoreşger di bin dexta malbatan xwe da ji şoreşê têن dûrxistin. Vê xirabîyê li xwe jî li zarokê xwe jî nekin! Berdin em bi serbilindî, ji bo parastina welatê xwe kar bikin. Em ne li welitekî serbixwe ne, ne jî neteweka serbixwe ne! Em nikarin wek ciwanan Elman, Tirk, Fransî, Yewnanî ... jîyaneka ji rêzê bijîn. Ji ber ku em neteweka bindest in û em şerê hebûn û tunebûnê didin. Ên ku ciwanan di vî şerî da, ji parastina şoreşa xwe dûr dixin, bila kîliyekê bifikirin. Ev bêrûmetîya ku ew qebûl dikin, dikarin li ser pişta zarokê xwe jî bar bikin! Em baş dizanin ku serkeftin teqeze e. Pişti serkeftinê wê zarokê we bêjîn ‘malbatê ez bi peran û derfetê jîyana burjuva xapandim.’ Lê ev şerm wê heta dawîya emrê wan bi wan ra be!

Ciwanan Kurdistanê, ji bo parastina rûmeta xwe ya mirovahîyê, ev bi dehan sal in, tu astengî nas nekirin. Ji neteweka şkestî û radestbûyî, pakrewanên dîrokî afirandin. Dewletê faşîst, zindanen wan, artêşen wan, polisên wan, dibistan û derfetê wan yên jîyana burjuva, malbatan paşverû ên ku temsîlkarîya dewleten burjuva dikirin, nekarîn meşa ciwanan a ber bi azadîyê ve bisekinînin. Ciwanan hem bi xwendin û rewşenbîrîya xwe mîjîya civakê ber bi pêşerojê ve rehnî kirin; hem jî bi pratîka xwe ya şoreşgerîya çekdarî derîyen jîyana azad, demokratîk û sosyalîst vekirin. Îro jî divê ciwan bi rihê raperînê, bi rihê serhildanê di vê pêvajoya seferberîyê da cihen xwe bigirin. Ên ku berjewendîyên xwe yên şexsî, malbatî û eşîrtî diparêzin, wek Barzanîyan û ENKSê, di nav xiyanetaka mezin da ne! Em iro nikarin malbatan xwe, karên xwe, jîyana xwe ya şexsî bifikirin! Em nifşen şoreş û serkeftinê ne! Em wek CKŞê bang li hemû ciwanan, jînên ciwan, ciwanan karker û ên xwendevan dikin; hevalno, xwişk û birano, rabin em ber bi enîyên herî pêş ve bimeşin.



Endamên Ciwanan Komûnist ên Şoreşger (CKŞ), li Qamîşlo li dijî êrîşen dagirkeryê belavok belav kirin. Jinên Ciwan perwerdeyên xweparastinê ên çekdarî didomînin.



**Mortalê zindî yên li Tişrînê wiha vegotin:
"Ger şoreş bedel dixwaze, em amade ne, gelê me bi QSDê ra ye"**

Hûn beşdarî çalakîya mortalê zindî ya li bendava Tişrînê bûn. Hûn dikarin ji me ra behsa beşdarbûna xwe ya çalakîyê bikin?

Berxwedan: Bi şev hate ragihandin ku ji bo piştgirîya şervanên QSDê wê çalakîya mortalê zindî bê lidarxistin. Ji ber vê yekê me yekser bangewazî kir. Em di saetek an du saetan da ji bo çalakîyê amade bûn. Em serê sibê bi rê ketin.

Êrîşen li ser rê çawa pêk hatin?

Berxwedan: Me dizanibû ku wê êrîş pêk were. Bi topan dest bi êrîşê kirin. Çend gule hatin berdan jî me rêya xwe domand. Di destpêkê da kesen ku heta niha êrîşeka wiha nedîtibûn hinekî ditirsîyan, lê yên xwedî tecrûbe aram bûn. Jixwe, yên din jî piştire tirsa xwe avêtin. Ez yek ji wan kesen xwedî ezmûn bûm. Ez birîndarekî şoreşger im. Dema ku bombebaranê dest pê kir yekem tişte ku min kir ev bû; min berguhê xwe derxist. Piştî êrîşê pirsgirêka min a bihîstîne derket û min dest bi karanîna amûrê berguh kir. (Dikene) Min berguh derxist û dijimin bêdeng kir.

Gelek kesen wek min hebûn. Hin ji wan pir pîr bûn, hema hema 80 salî bûn, di rê da zehmetî dikişandin, lê dîsa jî digotin 'em ê herin nobeta dawî'. Dewleta Tirk a ku ji êrîşen xwe yên li ser rê encam negirt, bi balafirêن xwe yên şer karwan kir hedef. Li vir hevalên me yên şehîd û birîndar hebûn. Wan ci kir jî, me bi ïnad rêya xwe domand û me xwe gihad bendava Tişrînê. Me nobet û çalakîyen xwe 4 rojan berdewam kir.

Yasmîn: Di destpêkê da min jîyan û mirin nedifikerî. Min nizanibû ku ew ê êrîşek ew qas giran be. Lê niha me bîryarek dabû û em di rê da bûn. Me got ci dibe bîla bibe em ê venegerin.

Dema êrîşan bi awayekî cidî bû metîrsîdar em ji wesayîtan peya bûn û me bi peyatî berdewam kir. Heta ku em gihaştin bendava Tişrînê em meşîyan. Wek jîneka ciwan, min di fişekîn ewil da tîrs hîs kir. Paşê min li der û dora xwe mêze kir moralê hevalan bilind bû, her kes pir bi coş bû. Morala min jî li wir rabû û ez ji tirsa xwe xilas bûm. Me berxwedana xwe domand. Min li hevalan mêze kir û çawa ku wan dirûşme qîrkîrin min jî qîr kir, ew çawa dimeşîyan ez jî meşîyam. Her kesi ji hev hêz girt. Li vir jîyan ji nû ve geş bû û berxwedan bi ser ket. Bi{j} berxwedana

me ya QSDê! Bi{j} berxwedana me ya YPJ!

Rûstem: Min nizanibû ku dê di destpêkê da ewqas êrîş çêbibin (Dikene). Em cûn û di rê da bombe barandin. Êrîşî pêşîya konvoye kirin. Li vir gel ji wesayîtan peya bûn û bi peyatî dewam kirin. Ez di maşînêye da li kîleka hevrêye me yê birîndar mam. Me bi hevrêye birîndar ra got em ê ci bikin? Hevrêye birîndar nikarîbû wê rîyê bimeşe. Di vê navberê da bombebaran li dijî kesen dimeşe jî dewam dike. Paşê em fikirin: Me got, "Jîyana me ji ya rîhevalên me ne bi qîmettir e. Ger ew şehîd bibin bila em jî bin." Min maşîne xebitand û em bi rê ketin. Gel li me nihîrî, maşînen mayî jî hêz ji me girtin û ketin tevgerê. Dema em gihiştin hevalên xwe em geleki kîfxweş bûn. Belê hevalên me yên şehîd jî hebûn. Birîndarêne me jî hebûn. Lê em cûn piştgirîya şervanên QSDê yên ku her roj li enîyên şer li ber xwe didin.

Me di tevahîya rûniştina xwe ya li wir da nobet girt. Xew pir kêm bû. Em ewqas bi coş bûn, ku me nedixwest em razên. Em weke endamên CKŞê her tim di nava girseyê da gerîyan.

Di vê berxwedanê da helwesta jînan çawa bû? We wek jîneke ciwan ci dît?

Yasmîn: Hemû jîn bi coş bûn. Me bi hev ra dirûşme qîrîn kirin, me govend gerand. Dengê me her tim bilind bû. Me berdêl da, me zehmetî kişand, lê di dawîye da em bi ser ketin.

Tu di êrîşa Balefira bêmirov ya dewleta Tirk da birînar bibû û tu bi vî awayî tevlî çalakîyê bû. Te ci jîyan kir, te çawa hîs kir?

Berxwedan: Ez dikarim ne tenê ji bo xwe, lê ji bo hemû hevalên xwe yên ku hatine çalakîye, bibêjîm. Moralê me pir bilind bû. Em qet poşman nebûn. Em tenê li hevalên xwe yên di rê da şehîd bûne fikirin û xwezi li gel me bin. Evarê çalakî hat ragihandin, ez ê emelîyat bibim û parçeyen lingê min ên mayî bêr rakirin. Lê ji bo vê çalakîyê min xwest emelîyatê taloq bikim. Min hemû pirsgirêken xwe yên tenduristîyê dan alîyekî. Di çalakîya mortalê zindî da ez piştgiri didim şervanên QSDê. Kesen ku beşdarî çalakîyê bûn, li birîndaran dinêrîn û moral digirtin. Her kesi me ji hev ra mînak nîşan dida, hêz û moral digirt. Çima em neyên?

Em dicin, em bi moral in, em xwedî irade ne, em dikarin her tişti bikin.

Gelê Kobanê dema hûn ji çalakîyê vegerîyan bi coş hûn pêşwazî kirin. Te ci hîs kir?

Yasmîn: Em ji vê çalakîyê vegerîyan, hîvîdar im hemû çalakîyên me bi ser bikevin. Dema em vegerîyan gelê me li ber goristana şehîdan em pêşwazî kirin. Girseyeka mezîn kom bibû. Bi coş û dirûşmeyan em pêşwazîkirin. Her kes bi nişaneyen serkeftinê li ser rî bû, zarokên biçük jî kîfxweş bûn. Dema em gihiştin Qada Arîn Mîrkan em geleki kîfxweş bûn. Ji ber ku em bi serkeftinê vegerîyan, çalakîyeka mezîn bû. Ev çalakî wê di dîrokê da were nîvîsandin. Em cûn mirinê û bi serfirazî vegerîyan. Hemû gelê me bi vê serbilind bû.

Berxwedan: Nobeta me li bendava Tişrînê di roja 4an da bi dawî bû û bi eşkere me nexwest em vegerin. Ji bo me derketina ji wê derê pir zehmet bû, ji me ra zehmet hat. Dema em hatin Kobanê gel bi coşka mezîn em pêşwazîkirin. Ji me hêz girtin. Gelek kesan got ku ew ê careka din herin, û wan bi rastî jî soza xwe girt. Karwana duyemin dîsa bi coş û bi girseyî derket rî.

Di konvoaya duyemîn da komunîstên Rojavayî jî cih girtin. Hûn dixwazin li ser vê yekê ci bibêjin?

Rustem: Hevalên me derketin rî û koma me ya din niha li wir e. Berî ku biçim min ji wan ra got, 'Li ser rî bombebaran û êrîş heye, netirsin. Me got, "Bidomînin, veger tune ye, li ber xwe bidin." Hevrêyên me bêtirs rîwîtiya xwe domandin.

Li ser koma duyemîn jî êrîş hat kirin û gelek hevalên me li wir birîndar bûn. Niha em dixwazin em jî li wir bûna. Divê me birîndar rakirina û ji bo bîranîna şehîdan li wir mabûna.

Berxwedan: Weke TKŞê koma me ya duyemîn bi moraleka mezîn derket rî. Min jî xwest biçim, lê destûr nedan min. Êrîş hebûn, fikir û dilê me her tim bi wan ra ye. Koma me ya sîyemîn jî amade ye, ger hewce bike koma çaran jî amade ye.

Yasmîn: Hevalên me cûn, em dixwazin dîsa biçim. Ez jî di nav bombeyan da fêrî berxwedanê bûm, min cesaret girt û tirsa xwe ji holê rakir. Em ê heta dilopa xwîna xwe ya dawî piştgirîya QSDê bikin. Hemû gelê me bi QSDê ra ye.

Komunîstên Rojavayî: Em şoreşa xwe ya Rojava diparêzin

Komunîstên bi armanca xurtkirina berxwedana xweparastinê li hemberî êrîşen li ser xaka şoreshê li bajarê Hesekê, Kobanê û Qamişlo taburêngel avakirin.

Komunîstan di bin navê Tabûra Şehîd Metîn Dîcle da yekemîn tabûra gel a **Hesekê** ragihandin. Di daxuyanîya têkildarî taburê da ev tişt hate gotin: "Em li pişt hêzên xwe yên QSD, YPG û YPJê ne. Em êrîşen dewleta Tirk a dagirker şermezar dikan. Divê dewleta

Rojavayî Türk baş bizane ku hêza me ti carî nayê şkandin. Em her tim amadene ku xwe biparêzin. Em ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe li ber xwe bidin."

Komunîstan têkildarî avakirina Tabûra Şehîd Yilmaz Behrareş a li **Kobanê** daxuyanî dan û gotin, "Şervanên QSD û YPJê berxwedaneka mezin nîşan didin. Leşkerêne me li her eniyê bi qehremanî şer dikan. Em weke gelê Kobanê jî, weke welatparêzên sosyalîst ji amade ne ku em welatê xwe biparêzin."

Li bajarê **Qamişlo** bi navê Tabûra Şehîd Zîlan Destan tabureka din a gel hate avakirin. Di axaftinê da bal hat kişandin ku êrîşen dagirkerîyê yên li dijî xaka şoreshê zêde bûne û ev tişt hatin gotin: "Dijmin hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Şoreşa Rojava dike hedef. Em baş dizanin ku ji bo tunekirina Kurdan, gelên bindest û destkeftîyên şoreshê hemû hêzên paşverû bûne yek. Ev bingeha itifaqa HTŞ û çeteyên Tirkan e."

Jinan Jî Taburêن Xwe Avakirin

Li **Hesekê** ji bo bîranîna şehîda komunîst a enternasyonal Avaşîn Têkoşîn Guneş taburek hate avakirin. Jinên Komûnist ên Şoreshger (JKŞ) avakirina Tabûra Şehîd Avaşîn Têkoşîn ragihandin. Di daxuyanîyê da hat gotin, "Em bi rôexistinbûna xwe bihêz in, bi vîna xwe em bi hêz in. Em amade ne ku bajarê xwe li dijî êrîşen dagirkerîyê biparêzin. Em amade ne ku ax û hêza xwe biparêzin. Çi dibe bila bibe em ê biparêzin."



JI MAHABAD HETA ŞOREŞA ROJAVA, JI BO KURDISTANA AZAD HÊR TIM HERNE PÊŞ

Dewletên herêmê yên emperyalîst û paşverû ev 100 sal in perçebûna eşîretî û lawazbûna hişmendîya netewî ya li Kurdistanê kirine fîrsend. Ji bo berjewendîyen xwe yên mêtîngehkar Kurdistan kirin çar parce. Her perçeyek ji desthilatdarîya mêtîngehkar a Îran, Tirkîye, Iraq û Sûriyê ra hiştin.

Têkoşîna me ya azadîya neteweyî li her parceyi di astêne cuda da berdewam kir. Tevî komkujiyên qirkirinê jî agirê me yê serhildanê qet venemirî. Serhildanê me bûne dîrok. Lî Rojhilatê Kurdistanê di 22yê Çileyâ 1946an da bi damezrandina Komara Kurdî ya Mehabadê, ji serhildanen derbasî avahîyeke nû ya dewletê bû. Gelê me yê ku di Şerê Parvekirinê yê Emperyalîst a 2emîn da jî fîrsendêne ku hatin pêşkeş kirin û piştgirîya Yekîtiya Sovyetê girt, di pêşengîya Qazî Muhammed da li Qada Çarçira bi coşeke mezin komarîlan kir. Qazî Mihemed bû serokomar.

Komara Kurdistanê ya Mehabadê bi manîfestohekê daxwazên netewî yên gelê me rave kir. Zimanê me azad bû û di saziyên perwerde û idarî da dihat bikaranîn. Pergalek hiqûqî ya ku ji bo her kesî edalet pêşbin dike hate pêşxistin. Mafêñ jinan hat dayîn. Li ser hişmendbûna gel hate sekinandin û dibistana seretayî hate ferzkirin. Bi navê Kurdistan rojnameyek derdiket. Radyoya Mehabadê hate vekirin. Yekîtiya Sovyet

a ku ji şerekî giran derdiket, bi qasî ku ji destê wan hat alîkarî da.

Wê demê jî weke iro li Rojhilata Navîn gelek destwerdanen emperyalîst hatin kirin. Di salêne Şerê Sar da ku ji alîyê DYE ve hatibû destpêkirin, Yekîtiya Sovyetê neçar ma ku ji herêmê vekiş. Dewleta Îranê bi piştgirîya Îngîlîz û Emerîkayê ji bo ku li sînorên xwe yên berê serdestiyê ava bike êrîşek da destpêkirin. Komara ku hîn sala xwe ya yekê danegirt bû, di warê leşkerî û aborî da qels bû. Gelek eşîran berjewendîyen xwe li pêş berjewendîyen netewî dan û piştgirîya xwe ji komarê vekişandin.

Komara Kurd a ku 11 mehan li vê parçeyê biçük ê Rojhilatê Kurdistanê şansê jîyanê girtibû, di 17ê Berfanbara 1946an da bi êrîşa leşkeren Îranê bi dawî bû.

